Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1008 | 26-Cotmeh 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

# ‘Bîrdank’ bal kişand ser çekên kîmyewî!

**8’emîn Mîhrîcana Şanoyê ya Şanoya Bajêr a Amedê ku bi dirûşmeya “Va Cûdî û va ye ev ax” li eywana Şanoya Bajêr a Amedê ya li semta Dîclekentê ya navçeya Peyasê ya Amedê destpê kiribû, di roja 3’’an de bi 3 lîstikan dewam kir.**

Bername bi lîstika “Qesra Balindeyên Xemgîn” ku ji ber pirtûka Bextiyar Elî hatiye nivîsandin û teksta lîstikê ji aliyê Alan Ciwan û Huseyîn Umaysiz ve hatiye nivisandin, dewam kir. Lîstik ji aliyê Xezal Redkanî û Alan Cîwan ve hat lîstin. Di lîstikê de lîstikvan li ser bedena xwe bi bêhn, deng, reng û stranan di dema niha de dikevin pey şopa rêçên xwe û dipirsin, “Ya ku me dike em çi ye?”



Roja sêyan a mîrhîcanê bi lîstika “Bîrdank” ku ji aliyê Rêveberîya Hunera Şanoyê ya Dihokê ve hatiye amadekirin, bi dawî bû.

### Bîrdanka Kurdan êş û elemên Kurdan e

Listika “Bîrdankê” rexneyeke mezin li modernîzmê dike û li gel modernîzmê veguherîna mirovan berbiçav dike. Li gel vê veguherînê çekdarbûyîna navneteweyî û şerên mirovahiyê ku mirov ji mirovbûnê dûr dixe radixe ber çavan. Derhêner vê yekê xwestibû bi maskeyên gazê di Bîrdankê de bi cih bike.

Listik li gel metafora sotemeniyê ku ji bo gelên cîhanê derfeta jiyana aramiyê ye, lê mixabin ji bo Kurdan mijara şerên navxweyî û rizîbûnê ye. Her ku sotemenî di nava axa Kurdistanê de heye, hem çavên hêzên hegemon hem jî Kurdên ku çavên wan birçî nahêlin yekîtî û aramî di nava Kurdan de bi cih bibe.

Di lîstikê de mîxfer wekî sembola desthilatê tê nîşandan. Desthilata ku karibe hemû Kurdan bîne cem hev, dema ku vê erkê digire, li dewsa xwişk û biratî û aramiyê bi pêş bixe, pêşî ji gelê xwe re dibe “ezbenî” û li gel Maskeya gazê û sotemeniyê warê mirovahiyê dike dojeha li ser erdê. Lîstik ji dîrokê gelek metaforên evîn, wijdan, çand û jiyana Kurdan di nava xwe de dihewîne. Di dawiyê de lehengê ku paqijî dikir maskeyên gazê, sotemenî û mîxfer xist nava gêlazê û diyar kir ku bîrdanka Kurdan êş û elemên Kurdan e.

Piştî lîstikê Şanoya Bajêr a Amedê plaket da lîstikvanan û lîstikvanan jî nûnerên xwe silav kirin.

*-Ozgurpolitika*

# Cotyaran bi çalakiyekê hişyarî dan hikumetê

**Komek cotyarên navçeya Koye dijî giranbûna nirxê sutemeniyê çalakiyek lidarxistin û diyarkirin ku ger bi vî awayî biçe, ew nikarin dexl û dan biçînin.**



Komek cotyarên navçeya Koye ya ser bi Silêmaniyê li ber derê embara Koye çalakiyek lidarxistin û diyarkirin ku hikumet girîngiyê nade sektora çandiniyê, eger wisan biçe, îsal ewê nekaribin berhemên genim û ce biçînin. Wek sedem jî dan zanîn ku nirxê sutemeniyê gelek bilinde û nikarin vê yekê pêşwazî bikin.

Cotyaran di çalakiya xwe de destnîşankirin ku bi salane ji ber hişkesaliyê dahatek paş çênabe, ev jî bandorek xirap li ser wan kiriye, niha jî pêwîstiya wan bi alîkariyê heye da ku bikarin zeviyên xwe de dexlûdan biçînin.

Nûnerê cotyaran Feqê Fetah got; “Hemû pirsgirêkên heyî bi nivîskî radestî hikumet û Wezareta Çandiniyê hatine kirin. Lê ti bersivek dilxweş nedane, eger cotyar û sektora çandiniyê nebe, wê hikumet binbikeve û xela destpê bike.- ***ROJNEWS***

# Yek ji sembolên Hewreman: Kulebal

Kulebal (Çox) yek ji bergên dîrokî yên Hewremane û wek sembolek ya Hewreman tê zanîn. Hemû tiştên ji bo çêkirina kulebal tên karanîn Kurdewarî ne û nexşê destê Hewramiyane. Lê niha ji ber bandora cilûbergên biyanî û hejmarek kêm ya hostayên çêkirina kulebalan, metirsiya tinebûnê li ser çêbûye.

Li gor çavkaniyên dîrokî, Kulebal yan Ferencî dîroka wan digihe serdema Medan a du hezar û 700 sal ji beriya niha. Kulebal dahênanek a Meda ye û di nivîsên mîxî (bizmarî) de îşaret pê hatiye kirin. Ji hiriya



berxan tê çêkirin. Rexên wan kun di hatin hiştin û di dema şeran de bivir dihatin xistina têde. Her wiha şal jî dahênana wan bû û ji mûyê bizinan tê çêkirin.



Derbarê kêmbûn û bikaranîna kulebal ku wek bergek resen a herêmê ye, Nivîskar Îbrahîm Mîke axivî û got: “Hewreman ji ber erdnîgariya xwe ku herêmek çiyayî û sare, Hewremaniyan karîne cilûbergên xwe jî li gor xwezaya herêmê çêkin.”

Îbrahîm Mîke diyarkir kulebal berhemek yê Hewremane û çêkirina wê jî bi berhemên xwemalî çêdibe. Her wiha diyarkir bi hiriya berx û mihan tê çêkirin. Mîke got hostayên ku Kulebal çêdikirin jî xelkê Hewreman bûn, ji ber wê zêde xercî li çêkirina wê nediçû.

Nivîskar Îbrahîm Mîke da zanîn ji ber bandora cilûbergên ji derve, xelkê Hewreman jî hêdî hêdî ji çanda xwe dûr dikevin.

Kulebal hem Zivistan hem jî Havînê lixwe dikin. Di Zivistanê de germe û di Havînê de jî hênike. Tê gotin



kesên berdewam kulebal bikartînin nexweşiya pişt êşê bi wan re kêm e. Cemal Narcelî ku xelkê Hewremane û bi berdewam kulebal bikartîne, got: “Berê hostayên çêkirina kulebal li gundan digeriyan û ji hiriya berxan kulebal çêdikirin. Herî zêde di Biharan de çêdikirin. Hiriyê li gel hêkê nava heve didan û dixistin qalib. Rengê wê jî li gor xwesteka mirov bû.”

Di dewamê de Cemal Narcelî da zanîn kulebal li cem wan tiştek pîroze û wiha domand: “Kulebal sembola bav û bapîrên me ne. Lê niha berhemên bazirganî bandorek zêde li ser cilûbergên resen ên Hewreman çêkiriye û ber bi tinebûnê ve diçin. Kes giringiyê pê nade, hostayên ku çêdikirin piraniya wan wefat kirine û li cihê wan de kes nemane çêkin.”- ***ROJNEWS***

Sudoku:Pirs18

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 6 | | 7 | 3 | 2 | | | |
| 8 | 3 | 5 | | | | 2 | 9 | |
| 2 | | | | | | 4 | | |
| | | 3 | | 5 | | | 4 | |
| | | | 4 | 2 | 9 | | | |
| | 9 | | | 8 | | 6 | | |
| | | 6 | | | | | | 2 |
| | 4 | 9 | | | | 5 | 7 | 1 |
| | | | 5 | 1 | 3 | | 6 | |

Sudoku: Bersiv 17

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 1 | 2 | 8 | 7 | 3 | 6 | 4 | 9 |
| 9 | 4 | 8 | 1 | 5 | 6 | 2 | 7 | 3 |
| 7 | 3 | 6 | 4 | 2 | 9 | 8 | 5 | 1 |
| 2 | 6 | 3 | 5 | 8 | 4 | 1 | 9 | 7 |
| 4 | 8 | 5 | 9 | 1 | 7 | 3 | 6 | 2 |
| 1 | 9 | 7 | 3 | 6 | 2 | 5 | 8 | 4 |
| 3 | 5 | 9 | 6 | 4 | 1 | 7 | 2 | 8 |
| 6 | 2 | 4 | 7 | 3 | 8 | 9 | 1 | 5 |
| 8 | 7 | 1 | 2 | 9 | 5 | 4 | 3 | 6 |

Quncika têgînan

| | |
|---|---|
| Insiyatîf (Fransî) | **1. Selahiyeta dayîna biryaran. 2. Teybetiya kesê dizane biryarên girîng bide: Filankes bi insiyatîf e. Di nava xwe de insiyatîfek ava kirin. Insiyatîf xist destê xwe.** |
| Kanalîzasyon (Fransî) | Di binê erdê de kanalên ku ava vexwarinê, yan jî ava pîs di wan de derbas dibe. Coya binerdî, Karêz. |
| Kongre (Fransî) | Civîna herî bilind ya partî, yan saziyekê ku biryar tê de tên dayîn, yan jî serok tên hilbijartin. |
| Komplo (Fransî) | Plan û projeyên bidizî. Bêbextî, mûamere: Serokên Kurdan tev bi komployan hatin girtin û kuştin. |
| Konsept (Fransî) | Konsept. Plan û projeyên ku gelek xalan di nava xwe de dihewînin: Êrişa ser Eyn Îsa parçeyek ji konsepta dagîrkeran e. |
| Panel (Fransî) | Rûniştin û civîna ji her kesî re vekirî. Yên tevlî dibin tev dikarin nêrîna xwe bêjin: Di tv. de li ser mijara jinan panelek hebû. |
| Pêngav | Destpêkirina karekî girîng, pêşdeçûyîn, çûna bi ser dijberê xwe de. Hemle: Pêngava 15ê Tebaxê ji bo Kurdan pir girîng bû. |
| Semîner (Fransî) | Civîna bi rêveberiya kesekî yan çend kesan, ji bo dayîna zanyariyan derbarê mijarekê de û gotûbêjkirina li serê: Mûhadere. Li ser mijara Neteweya Demokratîk semînerek hat dayîn. |
| Slogan (Fransî) | 1. Gotina kurt û balkêş ku nêrînekê diyar dike û bi hêsanî tê dubarekirin. Durişm: Çalakkeran bi “slogana” Bimire dagîrkerî” dewletên dagîrker şermezar kirin. 2. Gotina ku armanc û amûrên nasnema, civak û rêxistinekê bi awayekî cewher dide nasîn: Slogana filan partiyê ya vê serdemê wiha ye: |
| Statû (Fransî) | 1. Rewşa kesekî, di nava sazî yan civakê de: A. di şaredariyê de dixebite lê statûya wî (karker e, karmend de, berpirs e) ne diyar e. 2. Li welatekî rewşa civakekê di destûrnameyê de: Di destûra Tirkiyê de statûya Kurdan nehatiye diyarkirin. |

# Besê Hozat: Li Rojava divê civak ji bo Şerê Gelê Şoreşgerî amade be

Besê Hozat diyar kir ku dewleta Tirk ya dagirker dixwaze rêveberiya Xweser têk bibe û got, Eger li Rojava şerê gel ê şoreşgerî pêk bê, gel bi temamî tevlî vî şerî û têkoşînê bibe, wê dewleta Tirk derba herî giran bixwe.***R-4***



Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1008 | 26-Cotmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# XETA BÊRÎTAN LI ZAP, METÎNA Û AVAŞÎN JÎ BI SER DIKEVE

Ev 6 mehin ku dewleta dagirker ya tirk bi hevkariya PDK’ê re, bi her cûre çekên qedexekirî û kimyawî êrişî Zap, Metina û Aveşîn dike. Lê disa jî li hember tekoşîn û berxwedana gerilayên serdem, nikare bigihije armanca xwe û gerilayên serdem bi israrin ku xeta xiyanet û dagîrkeriyê bin bêxin.



## ‘Bêrîtan ronahiya jiyana azad e’



Şehît Bêrîtan (Gûlnaz Karataş) li dijî xiyanetê bû xeta berxwedanê. Niha jî bi hezaran gerîlayên azadiyê li Avaşîn, Zap û Metînayê li dijî xeta xiyanetê bi ruh û îradeya Bêrîtan re bûyine yek û li dîjî hovîtiya dewleta tirk û xiyaneta PDK’ê şer dikin ***R-2***

## HPG: 14 dagirker hatin cezakirin




Bi wesîleya salvegera şehadeta Bêrîtan (Gulnaz Karataş), gerîlayan çalakî lidar xistin. Di çalakiyan de 14 leşkerên Tirk ên dagirker hatin cezakirin û 2 helîkopterên Skorsky hatin derbekirin.***R-3***

`Dewleta tirk ji bo qirkirina gelê azad, biryarên navneteweyî bin pê dike` ***R-5***

## Serhildanên li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê berfirehtir dibin..R-3



DILYAR CIZÎRÎ
BI RIHÊ 1’Ê MIJDARÊ EM ......
*R-4*



Sîpan Şînda
Xemla Payîzê
*R-7*

# ‘Bêrîtan ronahiya jiyana azad e’

Şehît Bêrîtan (Gûlnaz Karataş) li dijî xiyanetê bû xeta berxwedanê. Niha jî bi hezaran gerîlayên azadiyê li Avaşîn, Zap û Metînayê li dijî xeta xiyanetê bi ruh û îradeya Bêrîtan re bûyine yek û li dîjî hovîtiya dewleta tirk û xiyaneta PDK’ê şer dikin

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Gûlnaz Karataş (Bêrîtan), di sala 1971’î de li Çewlikê tê dinê û li wir mezin dibe. Di sala 1989’an de li Zanîngeha Stenbolê fakulteya Zanistî û Bazirganî beşa îngilizî dest bi xwendinê dike. Di sala 1990’î de bi destgirtiyê xwe re tevli nava refên gerîla dibe û di Cotmeha sala 1992’yan de wek fermandara taximê, derbasî herêma Xakurkê dibe. di heman sale de dewleta tirk dîsa şerekî bi hevhariya PDK’ê re destpê kir û xwastin



di vî şerî de bi rêya xiyanetê PKK’ê û tekoşîna azadiya gelê kurd têk bibin. Şehît Bêrîtan bi israra xwe tevlî tekoşîna li dijî vî şerî bû.

**Bêrîtan bû xeta li dijî xiyanetê û mohra xwe li dîrokê xist**

Bêrîtan di sala 1992’yan de di şerê li dijî xiyanetê û dewleta tirk de, xeta teslîmiyetê red kir û heta guleya xwe ya dawî şer kir. Hêzên xayîn banga ‘Were teslîm bibe, em ê tiştekî bi te nekin’ dikin. Lê ew dibêje, ‘ ezê ti caran teslîm nebim’. Piştî ku guleyên wê xilas dibin, ji bo çeka wê jî nekeve destê dijmin, çeka xwe parçe parçe dike û wekî jinên Dêrsimê yên ku teslîmiyet qebûl nekirîn bi tilîliyan, xwe ji zinar de diavêje. Bêrîtan bi vê sekn û helwesta xwe, mohra xwe li dîrokê xist. Li dijî xiyanetê bû xeta berxwedanê û tekoşînê. Piştî şehadeta Bêrîtan bi salekê, artêşbûna jinan hat ragihandin. Ji ber vê yekê Gûlnaz Karataş (Bêrîtan) wek pêşenga artêşbûna jinan tê dîtin. Herwiha di PKK’ê de artêşbûna jinê ne tenê weke hêzekê leşkerî tê dîtin, weke hêza bingehîn ya afirandina kesayet û nasnameya jin û civakê ya bingehîn tê dîtin.

Bêrîtan beriya 30 salî bi çalakiya xwe li dijî xeta îxaneta ku her tim bibû têkçûna berxwedana gelê kurd, bû xeta berxwedan û tekoşînê. Ew evîndara azadiyê bû, heta roja şehadeta xwe bi sekn, fikr, şer û helwesta xwe bû pêşenga tekoşîna azadiyê. Ew bi îradeya xwe ya xurt nîşanî hemû hevalên xwe da ku jinên şer bikin rûmeta xwe diparêzin û azad dibin. Niha jî bi hezaran gerîlayên azadiyê li Avaşîn, Zap û Metînayê li dijî xeta îxanetê bi rih û îradeya Bêrîtan şer dikin û bi xwîna xwe, evsaneyên berxwedanê dinivîsin.

**Rêber Apo: Sekna Bêrîtan, rûmet û berxwedana mezin ya jinan e**

Rêber Apo di nirxandineke xwe de dibêje ‘Kesên şer dikin azad dibin, dema azad dibin bedew dibin û dema bedew dibin, tên hezkirin’. Rêbertî di vê nirxandina xwe de behsa bedewbûneke fîzîkî nake, behsa bedewbûneke fikrî dike. Piştî şehadeta Bêrîtan, Rêber Apo sekna wê nirxand û ji bo hemû jinan ev perspektîf da: “Keçek hebû bi navê Bêrîtan, ji gundekî



nezî Karakoçanê bû, nameyek ji min re nivîsîbû. Keçek pir kûr û xwedî hêzeke entellektûel bû. Pêşmerge bang lê dikin, dibêjin ‘radest bibe em tiştekî ji te nakin, em te nadin destê dewleta tirk û îşkenceyê li te nakin’. Lê ew teslîmî neteweperestiya kevneperest û pavşerûtiya kurd nabe. Bêrîtan teslîmiyetê ji xwe re qebûl nake, ji ber vê xwe ji zinaran de diavêje. Ev yek ne xwekujî, çalakiya herî mezin e. Xeta azadiyê ya ku ez esas digirim, ev e. Parastina rûmeta azadiyê ya wê, deynê ser milê me ye. Ev jî prensîba min e. Bêrîtan li dijî paşverûtiya kurd û neteweperestiya kevneperest, bi qehremanî li ber xwe da. Ev ji bo min diyarker û prensîb e. Ya Bêrîtan kiriye rûmet û berxwedana mezin a jinan e. Xeta Bêrîtan li gel me şêwazek e û ji bo me wesiyet e. Ez neferekî vê xetê me. Dê jin xeta Bêrîtan bişopînin. Heya aştiya birûmet neyê, dê vê xetê bidomînin. Ji bo min ya girîng, şerê li ser xeta Bêrîtanê ye. Ew peyam û bangawaziye ji bo me, ma dibe ku em Bêrîtanê ji bîr bikin!”

Niha jî li her deverê Kurdistanê û cîhanê, bi hezaran keç û xort li ser perspektîfa Rêbertî ya şer û bedewbûnê, li dijî hemû êrîşên dagirker li ber xwe didin.

**Jinên ku ji bo azadiya xwe şer dikin tên hezkirin**

Jinên ku ji bo azadiya xwe şer dikin her tim tên hezkirin. Jinên kurd bi Bêrîtanan re fêrî bedewbûnê bûn û hê jî dibin. Jinên ku ji bo azadiya gelê xwe bi fedayî şer dikin, tirsa herî mezin ya dijmin e. Niha di roja me ya îro de jî, dîsa li her dera Kurdistanê şerê li dijî xeta xiyanetê bi berxwedana Bêrîtan tê meşandin. Teybet şerê ku niha li gerîla li herêmên parastina media li dijî çakên herî pêşketî yên natoyê û çekên kîmyawî, berdewamiya şerê Şehît Bêritane û ev şere bi vîn bîryara Bêrîtana tê kirin. Xeta Gûlnaz Karataş bi israre ku wê bi ser bikeve.

# Jinan bikaranîna çekên kîmyewî şermezar kirin

**Navenda Nûçeyan**

Dayîkên Aşîtiyê ya navçeya Til Temirê û Yekîtiya Hiquqnasên Herema Cizîre bikar anîna çekên kîmyewî şermezar kirin.

Dayikên Aşîtiyê li Til Temir û Yekîtiya Parêzeran û hiqûqnasên Herêma Cizîrê bi daxyuaniyan êrişên dewleta Tirk yên Kîmyawî yên ser qadên gerîla şermezar kirin û bang li rêxistinên navnetewyî kirin ku bêdeng nemînin.

Dayîkên Aşîtiyê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku di van demên dawî de ew bûn şahidê êrîşên dewleta Tirk a faşîst ên li ser çiyayên Kurdistanê ku li hemberî hemû çekên qirkirinê jî em şahidiya berxwedana dîrokî a hêzên gerîla dikin û wiha gotin: “Armanca van hemû êrîşan vemirandina agirê şoreşa her çar aliyên Kurdistanê û qirkirina Kurdan bi hemû rêbazên mirovahiyê yên hovane ye. Lê li çiyayên Kurdistanê hêzên gerîla bi ser dikevin û dîroka navên 17 lehengan dinivîsin.”

Dayîkên Aşîtiyê dan xuyakirin ku agirê şoreşê yên ku bi berxwedan û şehadeta xwe rêya azadiyê geş kirin, ji ber vê yekê ye ku divê hemû cîhan wateya berxwedan û azadiya rasteqîn a li çiyayên Kurdistanê dibihîzin û nas bikin ku Kurd li rêya azadî û aştiyê digerin û wiha domandin: Divê ku dengê me bighêje hemû rêxistinên mirovî, hiqûqî û koalîsyona navdewletî ji bo rawestandina êrîşên hovane yên faşîst ên Tirk ên li ser herêmên parastina medya yê.”

Dayîkên Aştiyê banga piştgiriya gerîla kirin û wiha gotin: “Werin em bibin piştevanê kur û keçên xwe yên gerîla, em layiqî fedekarî û cesareta wan bin, em bibin yek deng û hêzeke bêhempa, da ku hemû hêzên emperyalîst û hegemoniya cîhanî têk bibin, planên wan pûç bikin û şer û şoreşa xwe li hember dijminên mirovahiyê bi ser bixînin.”

Herwiha Yekîtiya Parêzeran û hiqûqnasên Herêma Cizîrê li pêşiya Meclisa Edaleta Civakî ya li bajarê Qamişlo- Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi amadebûna bi dehan hiqûqnasan, daxuyaniyek dan.

Daxuyanî ji aliyê Endama Meclisa Edaleta Civakî Selma Silêman ve hat xwendin û wiha got; “Li ser axa Kurdistanê heta roja îro 2 hezar û 476 car bombeyên qedexekirî û çekên kîmyayî piştî wergirtina piştgiriya PDK ji aliyê dewleta Tirkiyê ve hatine bikaranîn. Di encamê de 153 şervanên Hêzên Parastina Gel ku li hemberî êrîşên dewleta Tirk bi bawerî û îradeyek xurt li ser xeta şehîdan bi ser ketin, şehîd bûn. Qanûna navneteweyî ya mirovahî bi giştî bikaranîna çekên ku dibin sedema birîndarbûn û êşên nehewce. Her wiha bikaranîn, hilberandin, embarkirin an firotina her cure çekên qedexekirî yên



biyolojîk û kîmyayî qedexe dike, lê tevî vê yekê jî dewleta tirk wan li ser gelê me û xwezaya me bi kar tîne.”

Di daxuyaniyê de bang li Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî û rayedarên pêwendîdar hat kirin ku li hember binpêkirinên dewleta Tirk, rawstin , herwiha ji Dadgeha Cezayê ya Navneteweyî daxwaz kirin ku dewleta Tirk ji sûcên şer û sûcên li dijî mirovahiyê bê darizandin.



# Vekirina pêşangeha 6`an ya Şehîd Herekol ya pirtûkan

Bi armanca pêşkêşkirina berhemên wêjeyî û çapkirina pirtûkên nû, herwiha belavkirin û pêşxistina çanda xwendinê, pêşangeha Şehîd Herekol ya pirtûkan li Qamişlo hat vekirin.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Bi pêşengtiya Desteya Çand û Hunerê ya bakur û rojhilatê Sûriyê û bi alîkariya Desteya Çandê li herêma Cizîrê, 22`yê vê heyvê li hola zana ya bajarê Qamişlo, bi durişma “Pirtûk Samanê Cîhanê ne”, Pêşangeha 6`an ya Şehîd Herekol hat vekirin. Ji herêmên bakur û rojhilatê Sûrî bi sedan rewşenbîr, nivîskar, siyasetmedar, endamên saziyên civaka sivîl û heskiriyên çand û nivîsê, tevlî vekirina pêşangehê bûn. Pêşengeh wê heta 29`ê Cotmehê dewam bike. Di pêşangehê de jî, jin di her alî de cih digire û pêşengtiyê dike. Herwiha rengê niviskarên jin jî di vê pêşangehê de diyar e. Pêşangeha bi tevlêbûna 51 weşanxane, pirtûkxane, saziyên çandê, navendên lêkolînan yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Şam, Latkiye, bakur û başurê Kurdistanê û dewletên derve (Iraqê, Misir, Tirkiyê, Belçîka û hwd. hat lidarxistin.

Di pêşangehê de 130 hezar pirtûk û 13 hezar sernavên pirtûkên çandê, dîrokê, wêjeyî, lêkolîn, fikrî, siyasî û civakî hene. Herwiha tê de beşên pirtûkên zarokan û yên li ser jinê jî hene. Pirtûk, bi zimanê erebî û kurdî ku bi zaravayên kurmancî, soranî û zazakî, herwiha bi zimanên suryanî û ingilîzî û tirkî jî hene.

Derbarê vekirina pêşangehê û giringiya wê de, endamê komîteya amadekirinê û nivîskarên ku beşdarî pêşangehê bûne, ji me re axivîn û dan zanîn ku vekirina pêşangehê gaveke pîroz e.

**`Armanc pêşxistina çanda xwendinê ye`**



Endamê komîteya amedekirina pêşangehê Ebdilmecîd Xelef got, armanca me ji vekirina vê pêşangehê ew e ku çanda xwendinê li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê pêş bikeve. Herwiha komkirina tevayiya nivîskaran û lidarxistina çalakiyên derbarê giringiya pirtûkan û pêşkêşkirina pirtûkên ku nû hatîn çapkirin e.

**`Tevî rewşa awarte me pêşangeh neda sekinandin`**

Ebdilmecîd diyar kir ku îsal ji ber rewşa li herêmê, pêşangeh bi derengî hat vekirin û axaftina xwe wiha domand: “Tevî rewşa awarte me pêşangeh neda sekinandin. Her salê di heyva Tîrmehê de pêşangeh tê lidarxistin. Lê, îsal ji ber rewşa avarte, alozî û zêdebûna êrişên dagîrkeriyê, vekirina pêşangehê dereng ma.”

**`Îsal tevlibûna pêşengehê ji salên çûyî baştir e`**

Ebdilmecîd bal kişand ser tevlîbûna nivîskar û weşanxaneyan ji pêşangehê re û ev yek li axaftina xwe zêde kir: “Îsal jimara beşdaran ji salên çûyî baştir e. Herwiha gelek nivîskar û weşanxaneyên cûda tevlî pêşangehê bûne.”

**Çalakî û semînerên di pêşangehê de tên lidarxistin**




Ebdilmecîd behsa çalakî û pêşbirkên ku wê di pêşangehê de bên lidarxistin kir û wiha got: “Wê rojane çalakî werin lidarxistin. Semîner wê bên dayîn û nîqaşên derbarê giringiya xwendina pirtûkan û çareserkirina pirsgirêkan û sedemên lewaztiyên çanda xwendinê, wê bên kirin. Herwiha wê pêşbirk werin çêkirin û wê pirtûk diyarî kesên serkeftî bên kirin.”

Endamê komîteya amadekirinê Ebdilmecîd Xelef di dawiiya axaftina xwe de got, em serkeftinê ji tevayiya nivîskaran re dixwazin û emê hewl bidin her salê pêşangehên wisa li dar bixin, lewra Pêşangehên bi vî rengî di serî de ziman, çand û hunera civakê diparêzin û bi pêş

**`Pêşangeha Herekol gava pêşketinê ye`**

Nivîskarê bi navê Ciwan Silo ku ew jî beşdarî pêşangehê bûye da zanîn ku ev pêşangeh, çanda herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê xurtir dike û wiha dirêjî da axaf-



tina xwe: “Em pir kêfxweş in ku pêşangeheke wiha hat lidarxistin. Lewra pêşangeha Herekol ji bo gelê herêmê, bi taybet ji bo nivîskaran pir biwate ye û gava pêşketinê ye.

**‘Di pêşangehê de Keda bi salan tê pêşkêşkirin’**

Ciwan di berdewamiya axaftina xwe de got, mirov bi pêşangehan jîhatî dibe û xebata xwe ya bi salan derdixe û pêşkêşî civaka xwe dike. Niha jî di pêşangeha Herekol ya pirtûkan de, gelek nivîskaran nivîs û pirtûkên xwe yên bi keda salan pêşkêş kirin. Ev jî dihêle ku nivîskar bikaribe xwe bigihîne xwandevanê xwe.

**‘Paşroja xwe bi xwendina pirtûkan ava bikin’**

Nivîskar Ciwan Silo di dawiyê de bang li ciwanan kir ku li çanda xwendinê xwedî derkevin, herwiha zimanê xwe biparêzin û paşrojeyên xwe bi xwendina pirtûkan dewlemet û ava bikin.



## Xemla Payîzê


**Sîpan Şînda**

Dema bayê hişk li guliya te dide
Û belawela dike wan biskên te
Yên li ser eniya te de hatîn xwarê
Dibizdine qulfên keziyên te
Ji tirsa bayê pîre payîzê

Bayê pîre payîzê bi awayekî gurr li guliya darên çiyayên poz bilind dide û mişînê têxe wan. Guliya wan darên qurmê wan stûr, rayê wan hinde kûr û qayîm li nav guhên hev dixe. Rayê dilê wan darên kevnar diqetîne. Ew dizanin ku ev ba ne bayê xêrê ye. Ew dizanin ev ba nîşana rewşeke din, hatina demsaleke din e. Ew dizanin êdî temenê xemla wan kurt bûye, ta laşê wan digire, ew diricifin, ew nikarine êdî ji cihê xwe bi lepitin. Ji ber ku ew dizanin rev feyde nake. Ewê li ber xwe bidin lê belê, ew dizanin xilasî ji ber payîzê nîne. Ew dizanine wê payîz wan têk bibe, wan rep û rût bike. Tirsa bayê payîzê pîse. Dema ew li guliya daran dide, wan çiqilîn e wan li nav guhê hevdu dixe, tirs xwe berdide di nava kûrahiya rayên wan. Zeratî tavêje pelên guliyên wan û hêdî hêdî xwe berdidin xwarê û kirasekî nû li ser bejna wan dike. Ew pel bi pel, çiqil bi çiqil, ta bi ta zer dibine.

Darên herî pêşî rengê xwe tavêjine darên herî kevnar. Pêşiyê ew xemla xwe diguherine, rengê payîzê ewilî li ser bejn û bala wan dixemile, ew mizgîniya payîzê didine. Belê rêlên welatê alîyek deşt û yek zozan êdî kirasê xwe diguherin û xeml û xêla wan mirovî sermest dike. Dema mirov li serê bistîyekê, li ser girekê yan ji kûpekê disekine û li xemla wan rêlistanên welatê poz bilind dinêre, mirov sermest dibe, mirov her û her mirêkare seyra wê xemlê bike, wan dîmenan bê mirin bikin. Mirov dikare salê carekê, wê xemlê bibîne û bijî ji ber wê destê mirovî jê naqete. Ji ber ku xemla payîzê kurt e. Çawa ku bûk xwe dixemilîne û ew xemla wê ya hinde xweşik kurt e, eyn xemla payîzê jî welê ye. Xemla wê kurt e, lê belê mirov jê têr nabe. Ji ber wê ew kêliyên hinde mirovî sermest dikin û dikişînine xwe, dest mirovî nakevin. Mirov dixwaze her tim di nava wê şahiyê de be. Ew dilê mirovî xweş, giyanê mirovî geş dike. Ew kêliyên kurt yên ku mirov di payîzê de dijî, giyanê mirovî ter dike, dilê mirovî şad û temenê mirovî dirêjtir dike. Dema ba li guliya wan darên kevnare dide û pelên wan li bin guhê hevdu dixe û wan li hewa direqisîne, çiqas mirovî sermest dike! Kêliyekî çiqas xweşe! Ew kêlî rayên dilê mirovî yên qurmiçî geş dike, sewtên evînê berdide kûrahiyên dilê mirovî.

Xemla payîzê çiqas dilê mirovî geş dike jî, lê belê ew xemgîniyekê jî bi xwe re tîne. Xemla payîzê dilê mirovî dibe welatên dûr, hizrên mirovî dibe rewşên kûr. Ji ber ku ew xeml û xêl jî kurt e. Ji ber ku di nava demekî kurt de wê ew xezam hemû wan daran terk bikin û wê ew dar, ew rêl hemû bimînine rût û tazî. Êdî ew wê di bin sir û seqema zivistanê de bi tenê bimînine.



Dema bayê payîzê li guliya daran dide
Bablesîtik wan xezaman
Yek bi yek ji jiyanê qut dike
Evîna min û te ji nû ve zîl dide
Di bin wan xezaman de

# Alikariya Yekîtiya Çandinî û Sewaldariyê ya ji bo sewalvanan

Hevserokê Yekîtiya Çandinî û Sewaldariyê li bajarê Dirêkê Hisên Usman, da zanîn ku Yekîtiyê ji destpêka damezrandina xwe ve gavên pir girîng avêtine û got, em tevayiya cotkar û sewalvanan bi rêxistin dikin û hewl didin ku pêwîstiyên wan peyda bikin.

**Rojbîn Zagroz/Dêrik**

Di van salên dawî de rewşa hewayê li seranserê cîhanê hatiye guhertin. Çimkî baran kêm e û ne di dema xwe de dibare. Ji ber wê bandoreke neyînî li çandinî û sewalkariyê hatiye kirin. Îsal jî baran li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê kêm bû. Ev jî ziyanê ne li çotkaran tenê li sewalvanan jî dike. Lewma, bihayê êmê sewalan pir bilind bû ye. Ji bo wê jî her salê yekîtiya Çandinî û Sewaldariyê êmê li sewalvanan belav dike.

Belavkirina êm li ser sewalan yek ji gavên girîng e ku ji hêla yekîtiya Çandinî û Sewaldariyê, bi alîkariya Kompanya Pêşxistina Çandiniyê



ve tê kirin. Belavkirin li gorî navên qeydkirî ji hêla Komîteyê ve tê kirin.

Derbarê rewşa sewalan li bajarê Dirêkê, Hevserokê Yekîtiya Çandinî û Sewaldariya li Dêrikê Hisên Usman ji me re axivî û bal kişand ser bandora hişkesalî, kêmbûna baranê û ziyana çandiniyê di van salên dawî de û got, rewşa hewayê bi awayekî pir neyînî bandorê li ser Sewalan dike.



**`Belavkirina êm barê sewalvanan sivik dike`**

Hisên Usman diyar kir ku ew bi tevayiya derfetên xwe alîkariya sewalvanên li herêmê dikin û axaftina xwe wiha domand: "Belavkirina êm li ser sewalan barê madî li ser milê xwediyên sewalan sivik dike. Lewra şêniyên Herêma Cizîrê bi taybetî yên gundan piraniya wan sewalan xwedî dikin. Herwiha çavkaniya wan ya sereke xwedîkirina sewalan e. Ji bo wê jî ew bi tevayiya derfetên heyî hewl didin ji wan re bibin alîkar."

Hisên Usaman derbarê jimara kesên ku sewalan xwedî dikin û jimara sewalên navçeya Dêrikê de ya li gorî serjimariya dawî ku ji aliyê Rêveberiya Çandinî û Sewaldariyê ve hatibû diyarkirin wiha got: "Jimara sewalvanan li bajarê Dêrikê 2 hezar û 850'î ye. Jimara sewalên weke pez 154 hezar e, ya bizinan hezar û 800 e, ya çêlan 4 hezar 700 e, gamêş hezar in û ya hespan jî 100 e."

**`Komxebatên belavkirina êm alozî û pirsgirêkên belavkirinê çareser dikin`**

Hisên da zanîn ku wan komxebatên ji bo belavkirina êmê sewalan ava kirine û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Ji bo ku em, êm bi awayekî lez li ser asta sewalan belav bikin, me hin komxebat ava kirin. Me dît ku ev rêbaz serkeftî bû, ji bo wê jî me komxebatên xwe zêde kirin. Niha jî 40 komxebatên belavkirina êmê sewalan li bajarê Dêrikê hene. Ev komxebat alozî û pirsgirêkên belavkirina êm çareser dikin."

Usman derbarê armanca aktîvkirina komxebatan de got, ji bo alîkariya cotkar û sewalvanan, herwiha sivik kirina barê wan di milê aborî de, me ji bo her 3-4 gundan komxebatek ava kir. Her komxebat ji pênc endaman pêk (Hevserokatî, Dîwan, erşîf, deravî û endamekî çavdêrê komeleyê) pêk tê. Herwiha got, tevayiya endamên di komxebatan de jî, qaxezên endamtiyê ji wan re tên çêkirin û li gorî wê qaxezê, êm



ji Yekîtiya Sewaldariyê werdigire. Usman behsa qaseya ku ji her sewalekê re tê dayin kir û wiha got: " Ji bo her seriyek gamêş, hesp, çêlek û deve 50 kg êm tê dayîn. Ji bo bizin û pez jî 10 kg tê dayîn.

Hevserokê Yekîtiya Çandinî û Sewaldariyê Hiseyîn Usman di




dawiya axaftina xwe de wiha got, wek yekîtiya Sewaldariyê emê hewl bidin rewşa sewaldarî li herêmê bi pêş bixin û di her rewşê de ji sewalvanan re bibin alîkar. Da ku Sewaldarî li herêma me têk neçe.

## Li Tebqayê semînerk derbarê xetereya madeyên hişbirê de hat dayîn

Li Tebqayê têkildarî xetereya madeyên hişbirê li ser civakê semînerek hat dayîn.

Komîteya Jinan a Rêvberiya Sivîl a Herêma Tebqayê bi koordîneya Komîteya Tenduristiyê semînerek li ser xetereya madeyên hişbirê û bandorên wê li civakê û taybet li ciwana da.

Semîner li hola perwerdeyê ya Nexweşxaneya Wetanî bi amadebûna nûnerên komîteyên Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê, meclisên leşkerî, Yekitiya Jinên Ciwan û Tevgera Ciwanên Şoreşger a Sûriyê hate dayîn.



Semîner ji aliyê bijîşkê pisklojîk Ebdulsemed El Casim ve hat dayîn. Dr. Ebdulsemed El Casim diyar kir ku pirsgirêka karkotîkê pirsgirêkeke cîhanî ye û got: "Bê guman pirsgirêka madeyên hişbirkê û bazirganiya wê yek ji dosyayên ewlehiyê ye ku di gelek kongre, an semîner an jî komxebatên navneteweyî de tê nîqaşkirin, ji ber ku yek ji pirsgirêkên cîhanî ye ku di 20 salên dawî de aştî û ewlehiya cîhanê dixe metirsiyê û wekî şerekî taybet li dijî beşeke civakê tê bikaranîn."

El Casim behsa sedemên ku dihêle mirov madeyên hişbirê bibin û got, hinek sedem girêdayê ferd, hinek malbat û hin din jî girêdayî civakê ne. El Casim bal kişand ser bandorên madeyên hişbirê yên li dirûnî, fîzîkî, aborî civakî,



siyasî, bi taybet li bandorên wê li ciwanan.

El Casim rêbazên pêşîlêgirtina birina madeyên hişbirê û rêbazên tedawiya wê anî ziman û got: Divê malbat li zarokên xwe guhdar bikin û pirsgirêkên wan nas bikin û çareser bikin. Malbatên ku bi zarokên xwe ve eleqedar dibin îhtîlama ku zarokên wan madeyên hişbirê bi kar tînin bi qasî 5 caran ji yên ku bi wan re eleqe çênabe kêm dibe. Divê malbat bi zarokên xwe re aram bin û rêbazên durist ji bo wan deynin."


Hêjayî gotinê ye ku Komîteya Jinan bernemayeke taybet ji bo hişyarkirina ji xetereya madeyên hişbirê daniye. li gorî bernameyê, wê hefteyê carekê semîner were dayîn.-***ANHA***

## Mirovan di bin avê de jî ji zindiyan re jîyan nehiştine

Li gor lêkolînên ku hatine kirin torên masiyan yên bin avê, nexasim jî yên bin behran bûne bela serê zindiyên bin avê û jiyana wan bi her awayî dixin talûkeyê. Li gor agahiyan torên masiyan yên ku di bin avê de hatine jibîrkirin dikarin li derûdora dinyayê 18 caran bên gerandin ewqasî ku zêde ne!

Li gor nûçeya Science Alert her sal bi milyaran şewk û torên masiyan di bin avê de dimînin. Ev torên ku di bin avê de dimînin weke "torên xeyalet" tên binavkirin. Ev "torên xeyalet" di bin avê de bi kîlometreyan dirêj dibin û gelek zindiyên li van toran diheliqin, dimirin. Her wiha ev torên xeyalet bi hebûna xwe bin avê jî qirêj dikin.

Di nav zindiyên bin avê yên ku li van toran diheliqin û dimirin de hin masiyên ku kêm tên dîtin jî diheliqin û bi vî awayî tovên wan diqele! Weke mînak semasî li gor berê pirr kêm mane û hejmara wan her ku diçe kêmtir dibe ji



ber van torên xeyalî.

Di nav tîma ku vê xebatê pêk anî de ji Zanîngeha Tazmanya Kelesy Richardson jî hebû û wî got ku ji bo lêkolînên xwe yên di vî warî de wan bi masîgiran re hevdîtin pêk anîne. Di çarçoveya vê xebatê de ji 7 welatan bi 450 masîgiran re axivîne û li gor malzemeyên ku ew bikaranîne û di bin avê de hiştine rapora xwe nivîsandine. -***Ozgurpolitika***



# HPG: 14 dagirker hatin cezakirin

Bi wesîleya salvegera şehadeta Bêrîtan (Gulnaz Karataş), gerîlayan çalakî lidar xistin. Di çalakiyan de 14 leşkerên Tirk ên dagirker hatin cezakirin û 2 helîkopterên Skorsky hatin derbekirin.

**Navenda nûçeyan**

Derbarê çalakiyên Gerîlayên Azadiyê, Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê daxuyaniyek da.

HPG`ê diyar kir ku tîmên wê yê bitevger ji bo bîranîna salvegera çalakiya dîrokî ya sembola artêşbûna wan ya jinê, fermandara nemir Bêrîtan (Gulnaz Karataş) çalakî lidar xistin û di encamê de 14 dagirker hatin cezakirin, dagirkerek jî birîndar bû. Herwiha derb li 2 helîkopterên Skorsky û çeperekê hate xistin.

HPG`ê diyar kir ku di 21'ê Cotmehê de li Qada Berxwedanê ya Sîdayê, tîmên wan yên bi tevger xwe berdan nava dagirkerên li dora çeperên şer ên Şehîd Agir û ji nêz ve lê dan.Di encamê de 8 dagirker ceza kirin. Herwiha di 22'ê Cotmehê de li Qada Berxwedanê ya Çemçoyê, tîmên wan yên bi tevger derb li çepereke dagirkeran xistin.

HPG`ê da xuyakirin ku di 23'ê Cotmehê de li Qada Berxwedanê ya Çemçoyê, tîmên wan li dagirkeran xistin û di encamê de 2 dagirker hatin cezakirin. HPG`ê ragehand ku di 23'ê Cotmehê de li Qada Berxwedanê ya Çemçoyê, tîmên wan çalakî kirin û dagirkerek ceza kirin, yek jî birîndar bû. HPG`ê da zanîn ku di 23'ê Cotmehê de li Qada Berxwedanê ya Çemçoyê, tîmên wan bi çekên giran li dagirkeran xistin û encamê de 3 dagirker hatin cezakirin.

HPG`ê ragehand ku di 23'ê Cotmehê bi şev li Qada Berxwedanê ya Sacayê helîkopteran xwestin hêzên xwe li qadê deynin, tîmên wan yên bi tevger lê dan. 2 helîkopterên Skorsky yên derb ji hêzên me xwarin bêyî ku karibin hêzên xwe li qadê deynin neçar man ji herêmê biçin.




HPG`ê da xuyakirin ku di 23'ê Cotmehê li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî çeperên şer ên Şehîd Yûnûs, li Qada Berxwedanê ya Çemçoyê çeperên şer ên li Şehîd Botan û Şehîd Bahoz, li Qada Berxwedanê ya Sîdayê çeperên şer ên li Şehîd Felat 7 caran bi bombeyên qedexekirî û çekên kîmyewî hatin bombekirin."

## Serhildanên li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê berfirehtir dibin

**Navenda Nûçeyan**

**Serhildanên gel yên ku li dijî rêjîma Îranê li Rojhilatê Kurdistan û tevayiya Îranê belav bûne, roj bi roj firehtir dibin û êdî xwendekar pêşngtiyê dikin.**

Li gor agahiyên hatîn bi destxistin, li bajarên Merîwan, Sine, Seqiz, Kirmanşan, Bane, Mehabad, Şîraz, Tehran û li gelek bajaran xwendekar neçûn dibistanê. Di heman demê de Sendîkaya Mamosteyan banga grevê li mamosteyan kiribû. Hatibû xwestin ku bila mamoste biçin dibistanê lê nekevin dersan. Herwiha bang li malbatan jî hatibû kirin ku bila malbat zarokên xwe neşînin dibistanê. Mamoste çûn dibistanê lê, neketin dersan. Di 23'ê Cotmehê de mamosteyan tevî xwendekaran li gelek bajaran, çalakiya rûniştinê li dar xistin û banga rejîmê kirin ku mamoste û xwendekarên girtî werin berdan.

Li Tehranê li Zanîngeha Şerîfê di navbera hêzên Basîc û xwepêşandaran alozî çêbû. Hêzên Basîcê deriyê xwarinxaneya zanîngehê girtibûn, xwendekaran bariyerên hêzên Basîcê derbas kirin û ketin xwarinxaneyê. Herwiha li Zanîngeha Razî ya Kirmanşanê, Zanîngeha Zanistanên Tipê ya Zahîdanê, Zanîngeha Zanistên Civakî ya Tehranê, Zanîngeha Şerîf, Zanîngeha Emîr Kebîr, Zanîngeha Tehranê, Zanîngeha Meşhed Fîrdewsî, Zanîngea Îsfahanê û li gelek zanîngehên Îranê, xwendekaran rejîma Îranê protesto kirin.

Li Merîwan, Ciwanro û Seqizê mamosteyan mesaî boykot kirin. Qetilkirin û girtina mamoste û xwendekaran şermezar kirin.

Li Sinê jî hêzên Îranê gule li xwendekarên jin reşand. Li herêmên cihê yên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê xwendekarên



amadekariyê, di nava dibistan û derveyî wê tevlî protestoyan dibin.

Di şeva 23 Cotmehê de li herêmên Sine, Diwander, Serdeşt ên Rojhilatê Kurdistanê û li herêmên eyaletên Bender Abbas û Mazandaranê xwepêşandanên protestoyê hatin lidarxistin.

## Fermandariya Biryargeha NPG`ê peyameke pîrozbahiyê weşand

**Navenda Nûçeyan**

**Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel (NPG) peyameke pîrozbahiyê ji bo şervan û fermandarên Pêngava Şehîd Diljîn-Şehîd Şervan Êrkendî yên Egîdên Botanê, weşand.**

NPG`ê di peyama xwe de diyar kir ku 13'ê Cotmehê li qada Kato Xelîla ya navçeya Şax a Wanê, li dijî dagirkeran bi rê û rêbaza serdema nû çalakiyeke koordîneyî ya gerîla hate lidarxistin û wiha got: "Tîmên YJA Starê yên bi tevger, ji sê baskan ve bi çekên ferdî li yekîneya dagirker xistin. Di encamê de 10 dagirker hatin cezakirin û dagirkerek jî birîndar bû."

NPG`ê da xuyakirin ku çalakiya YJA Starê ya serketî careke din raxist pêş çavan ku rêbaza tîmê pispor ya Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê, teqez encamgir e û wiha got: "Dewleta Tirk ya mêtinger bi rêya medya xwe ya şerê taybet derba giran a ku xwar, hewl da veşêre û tenê kuştiyekî xwe yê di vê çalakiyê de eşkere kir. Tîmên bi tevger ku ji nişka ve li her deverê derbên xurt li dijmin dixin, bi vê çalakiyê jî Pêngava Şehîd Diljîn-Şehîd Şervan Êrkendî ya Egîdên Botanê ya li qadê xurt kirin. Şerê tîm ê pispor ku rêbaza şer a demê ye bi rengekî rast û afirîneriyeke bilind, xistin meriyetê. Ev darbeya



li dagirkeran hate xistin ku îdîa dikirin bi teknîkê li dijî gerîla serwer e, propagandayên şerê taybet ên dagirkeran ku xwe dispêrin derewan, careke din pûç kir û di performansa şer a Gerîlayên Azadiyê de bû mînakeke serketî ya hunera bicihanîna asta pêşketî ya taktîkê."

NPG`ê da zanîn ku hêzên wan ku li Bakurê Kurdistanê li gel bi sedan operasyon û bi hezaran êrîşên dagirkeran xwe diparêzin û di heman demê de bi ruhekî bilind ê êrîşê û afirîneriya mezin a taktîkê çalakiyên bi bandor dikin, bi rengekî şênber raxistin pêş çavan ku rêbaza tîmên pispor ên bi tevger, meşa li ser xeta serketinê ye.

Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel (NPG) di dawiya peyama xwe de hemû şervan û fermandarên tevlî Pêngava Şehîd Diljîn-Şehîd Şervan Êrkendî ya Egîdên Botanê bûne û bi serketine, pîroz kirin.

# Besê Hozat: Li Rojava divê civak ji bo Şerê Gelê Şoreşgerî amade be

Besê Hozat diyar kir ku dewleta Tirk ya dagirker dixwaze rêveberiya Xweser tisfiye bike û got, Eger li Rojava şerê gel ê şoreşgerî pêk bê, gel bi temamî tevlî vî şerî û têkoşînê bibe, wê dewleta Tirk derba herî giran bixwe.

**Navenda Nûçeyan**

Hevseroka Konseya Rêveber a KCK'ê Besê Hozat, di beşa duyemîn a hevpeyvîna xwe de ya li gel Medya Haber TV, rewşa li Îranê, Iraqê, Sûriyeyê, Rojavayê Kurdistanê û siyaseta desthilatdariya AKP-MHP'ê ya li hemberî Elewiyan nirxand.

**`Elewîtî baweriyeke demokratîk e, azad e û xwedî edalet e`**

Besê Hozat diyar kir ku desthilatdariya AKP-MHP'ê polîtîkaya dewletê ya sed salî ya li dijî Elewiyan gihandiye asta herî bilind û got: "Desthilatdariya AKP-MHP'ê Elewîtiyê weke baweriyê jî qebûl nakin. Li gorî vê ferasetê, Elewîtî çandeke ku di nava sînorekî teng de ye. Hinek hene ku bi vê polîtîkayê dixapin. Erdogan çû, hinekan ew pêşwazî kirin. Tê gotin ku heta astekê serlêdan li Wezareta Çandê hatiye kirin. Yên ku van dikin, bi gotina Elewiyan dibêjim; hemû ketî ne, xayin in, noker in. Ti eleqeya wan bi Elewîtiyê, bi çanda Elewîtiyê, bi baweriya Elewîtiyê nîne. Elewîtî baweriyeke demokratîk e, baweriyeke azad e, baweriyeke xwedî edalet e. Elewiyekî ku cihê xwe li gel desthilatdariyeke faşîst, nijadperest û neteweperest bigire, ti eleqeya xwe bi rastî, çandî û kevneşopiya Elewîtiyê nîne. Divê Elewî vê rastiyê bibînin."

**`Dirûşma 'Jin, Jiyan, Azadî' mêr û civakê diguherîne`**

Besê Hozat di dewama axaftina xwe de xwepêşandanên li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê nirxand û got, "Jin û gelên Îranî li dora Jîna Emînî li hev kom bûn. Zêdeyî meheke serhildan heye. Di dîroka nêz de yekemcar bi vî rengî dibe. Beriya niha li Îranê di vê astê de serhildan nebûbû. Jinan wesfê vê serhildanê zêde kir. Civaka Îranê civakeke dayiksalar e. Fars û Kurd gelên xizmên hev in. Bi sedan, bi hezaran salan di heman konfederasyonê de bi hev re jiyan. Besê Hozat da zanîn ku dirûşmeya `JIN JIYAN AZADÎ` li çar aliyê cîhanê belav bû û wiha got: "Serhildan bi kûrahî dewam dike. Dirûşma 'Jin, Jiyan, Azadî' mêr diguherîne, civakê jî diguherîne. Ev dirûşm li cîhanê belav bû. Li çar aliyên cîhanê, li hemû welatên herêmê çalakî bi vê dirûşmê têne lidarxistin. Jiyaneke ku xwe nespêre jin a azad, jiyaneke bi koledarî ye. Jiyana ku xwe bispêre jin a azad, jiyaneke rasteqîn e. Ev dirûşm nîşaneya vê yekê ye. Divê Îran bersivê bide daxwazên jinan, civakê û gel."

**`Wê li Iraqê kaos dewam bikin`**

Besê Hozat rewşa siyasî ya herî dawî ya Iraqê nirxand û wiha got: "Iraq bi dehan salan bû qada şerê hegemonya Îran û Emerîkayê. Îngilistan, welatên Ewropayê, Tirkiye û gelek dewletên din Iraqê tevlîhev dikin. Tirkiye li ser berjewendiyên xwe Tirkmenan bi rêxistin dike, kaosê giran dike. Kerkuk Başîka ji xwe re kiriye baregeh, ji ailyê siyasî, aborî û leşkerî ve Iraqê tevlîhev dike. Birêz Dr. Letîf Reşîd weke Serokkomar hate hilbijartin, Em



li bendê ne ku bi roleke erênî rabe. Li hemberî polîtîkayên Neo-Osmanî û dagirker ên dewleta Tirk, girîng e ku dewleta Iraqê helwesteke cidî nîşan bide. Hikumeta bi serokatiya Sûdanî dibe ku ava bibe, li Iraqê bi avakirina hikumetê re kaos zû bi zû çareser nabe. Rageşiya li Bexdayê dibe ku kêm bibe, lê kaosa li Iraqê wê dewam bike. Ji ber ku her kes wê bixwaze hikumeta ava bibe li ser bingeha berjewendiyên xwe bi rêk û pêk bike. DYE, Îran, Tirkiye wê hewl bidin ber bi aliyê xwe ve bikişînin.

**`Dagirkeriya Tirk dixwaze Başûr û Rojava desteser bike`**

Besê Hozat balkişand ser roşa bakur û rojhilatê Sûriyê û wiha got: "Dewleta Tirk ya dagirker dixwaze bakurû rojhilatê Sûriyeyê tasfiye bike. Dixwaze li van qadan dewleteke çete ava bike. Bêguman ji Rûsya û Îranê re nabêje 'ez dewleteke çete ava dikim'. Rêveberiya Xweser weke pirsgirêkê nîşan dide. Dibêje, 'Eger hûn di vê mijarê de piştgiriyê bidin min, ez ê jî di mijara Ûkrayna, Idlib û Esad de hin tawîzan bidim we, peyama vê yekê dide. Lê belê bi esasî plana dewleta Tirk Mîsakî Mîllî ye. Dixwaze Başûr jî, Rojava jî tevlî Tirkiyeyê bike û desteser bike. Vê yekê jî bi qirkirina Kurdan dike.

**`Divê civak ji Şerê Gelê Şoreşgerî re bê amadekirin`**

Hevseroka Konseya Rêveber a KCK'ê Besê Hozat da zanîn ku divê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê siyaseteke bi bandor, dîplomasî û têkoşîneke xurt bimeşîne û wiha dewam kir: "Li Rojava ji 7 heta 70 salî divê civak teqez ji şerê gel ê şoreşgerî re bê amadekirin. Eger em karibin li Rojava şerê gel ê şoreşgerî pêk bînin, gel bi temamî tevlî vî şerî û têkoşînê bikin, her ferdên civakê mîna QSD'ê têbikoşe, seferber bibe, hingî ev plan wê teqez têk biçe û dewleta Tirk jî derba herî giran bixwe."



## BI RIHÊ 1'Ê MIJDARÊ EM PIŞTGIRIYA GÊRÎLA BIKIN

**DILYAR CIZÎRÎ**

Çend rojên din salvegera 8'an a 1'ê Mijdarê Roja Kobanê ya Cîhanê ye. Ew roj di dîroka gelê kurd a tekoşîna azadiyê zêde bû û bû hêmana bingehîn a têkçona DAIŞ'ê. Di heman demê de derbeyek mezin li piştevanê wan jî hat xistin.
Di wê rojê de li çar hêlên cîhanê demokrat, sosyalîst, rewşenbîr, nivîskar û hunermend ji gelên cuda bi bi milyonan mirov, derketin kolanan û destek dane berxwedêrên Kobanê. Ew roj ji gelê kurd re pêngaveke nû ya serkeftinê bû.
Îro gelê kurd li bendê ye ku pêşwaziya 1'ê Mijdarê bike. Dewleta Tirk a hebûna xwe bi qirkirina gelê kurd ve girêdaye, bi her awayekî êrişên xwe didomîne û dixwaze dawî li tekoşîna azadiyê ya gelê kurd bîne.
Êrişên li dijî Gêrîla derxistiye asta herî jor û çekên kîmyawî û cûreyên din ên çekên qedexekirî bikar tîne. Em dinêrin rojane ji herêmên Zap, Metîna û Avaşîn dîmenên êrişên hovane yên dewleta Tirk tên belgekirin û bi raya giştî re tê parvekirin. Lê mixabin hîn jî cîhan û civaka navdewletî û taybet jî saziyên qedexekirina çekên kîmyawî, çavên xwe ji vê rastiyê re digirin.
Ev jî piştevaniya wan a bi dewleta Tirk re nîşan dide. Di heman demê de êrişên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi gelek rê û rêbazan bi armanca valakirina herêmên Rêveberiya Xweser û têkbirina aramiyê, bê navber dewam dike.
Li aliyê din jî zext û zordariya li dijî Bakurê Kurdistanê derxistiye asta herî jor. Plan û êrişên dewleta Tirk ên li hemû aliyan, di çarçoveya yek planî de pêk hatiye. Bingeha wan jî tecrîda girankirî ya li Imralî yê ye.
Li beranberî êriş û planên dewleta Tirk, gelê kurd li ser piya ye û di nava tevger û çalakiyan de ye. Niha em dinerin li dijî bikaranîna çekên kîmyawî û ji bo piştevaniya berxwedana gêrîlan, li hemû aliyên cîhanê çalakiyên gel têne lidarxistin.
1'ê Mijdarê Roja Cîhanê ya Kobanê gel bû stûneke bingehîn a piştevaniya şervanên YPG/YPJ'ê û tekoşîna li dijî DAIŞ'ê ku piştevanê wê ya herî mezin dewleta Tirk bû, bi serket û di encam de DAIŞ li Baxozê di aliyê leşkerî de hat şkandin.
Niha jî pêwîstî pê heye ku bi rihê 1'ê Mijdarê ev pêvajoye veguhere pêngaveke din a piştgiriya gêrîlayên azadiya Kurdistanê yên di şert û mercên herî zehmet de li dijî alav û teknîna pêşketî ya dewleta Tirk û kîmsalê, li ber xwe didin.
Ji hemû gelê kurd û dostên wan tê xwestin ku di 1'ê Mijdarê de, rihê berxwedanê derxin asta herî jor.
Divê saziyên qaşo ji bo qedexekirina çekên kîmyawî hatine avakirin û niha erka xwe pêk nayînin, mecbûr bibin ji bêdengiya xwe derkevin.
Em ji bîr nekin ku hêzên gêrîla berxwedana Kobanê geşkirin û rola wan a serkeftina Kobanê ya sereke bû.
Niha ji her kesî tê xwestin ku bi rihê 1'ê Mijdarê li dijî bikaranîna kîmsyalê û şehîdxistina gêrîlayan, erk û berpirsyariyên xwe pêk bînin.

# Partiyên Siyasî : Divê hikumeta Şamê hebuna dagirkeriya Tirk li ser xaka Sûriyê qebûl neke

**Zana Roj/ Şehba**

**Kordînasyona Ofîsa Têkiliyên Partiyên Siyasî Ya herêma Efrînê bang li hikumeta Şamê kir ku nebe hevkarê planên dagirkeriya Tirk û got, divê hikumeta Şamê hebûna dagirkeriya Tirk li ser xaka Sûriyê qebûl neke.**

Di 24 ê Cotmehê de, Kordînasyona Ofîsa Têkiliyên Partiyên Siyasî Yên herêma Efrînê, derbarê derbasbûna Cebhet AL Nusra ji Efrîna dagirkiriyê re û planên dewleta Tirk ya dagir daxuyaniyek da. Di daxyaniyê de planên dewleta Tirk ya dagirker yên ser xaka Sûriyê hatin şermezarkirin û bang li hikumeta Şamê hat kirin ku deriyê xwe ji tevayiya gel û partiyên Sûrî re veke.

Daxuyanî li parka Ehdasê ji aliyê Welîd Dengelî ve hat xwendin.

Di naxyaniyê de hat diyarkirin ku dewleta Tirk bi riya pişgirtiya komên çete weke DAIŞ û Heit Tehrîr elşam ( Cebht Al-Nûsira), bi awayekî eşkere dest davêje nav kêşeyên hindirîn yên Sûriyê û wiha dewam kir: "Bêdengiya hikumeta Şamê û hikumetên Erebî bandorekê neyênî li ser gelên herêmê dike. Êdî Sûriyê gihîşt astekî ku kes nikare pêşeroja



wê texmîn bike."

Partiyên siyasî dan xuyakirin ku di demên dawî de wan dît ku çawa li ber çavên dinyayê dewleta Tirk çeteyên Al-Nûsira ya ku li ser lîsteya terorê ye, derbasî hin herêmên Bakûrê Sûriyê kir û bi taybetî li herêma Efrînê ew bicih kir. Em jiu hikumeta Şamê dixwazin ku nekeve xefka dagirkeriya Tirk û deriyê danûstandinê bi hemû gelên Sûriyê re, ji bo çareserkirina kirîza heyî veke. Herwiha Em ji hemû kesên xwedî rûmet û welatparêz yên li herêmên dagirkirî daxwaz dikin ku nekevin xefka dewleta Tirk ya dagirker de. Herhiwa em ji civaka navnewletî daxwaz dikin ku zextê li ser dewletên xwedî bandor li ser biryara Tirkiyê bikin ku êdî mudaxeleya dewletên derdor neke."



# `Dewleta tirk ji bo qirkirina gelê azad, biryarên navneteweyî bin pê dike`

Gelê azadîxwaz li her çar parçeyên Kurdistanê û derveyî welat, helwesta xwe ya li hember êrişa dewleta tirk ya bi karanîna çekên kimyewî yên ser gerîlanyên azadiyê, nîşan didin. Welatiyên bajarê Qamişlo diyar kirin ku, dewleta tirk parêzvanên azadiya gel bi planên xwe yên qrêj, şehîd dixe.

**Dilîn Ehmed-Qamişlo**




Di êrişên Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî de jî, dewleta tirk ya dagîrker çekên kimawî li dijî şervan û sivîlan bi kar anî bûn. Niha jî carek din dewleta tirk ya faşist, bi hişmendiya xwe ya qirkirina gelê Kurd bi planên xwe yên qirêj li dijî gerîlayên azadiyê, li ber çavê hemû cîhanê çekên qedexekirî yên kimyawî, bi kar tîne. 18'ê Cotmehê Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel (HPG'ê) nasnameya 17 şervanên xwe yên di êrişên bi çekên kîmyewî yên dewleta tirk ya dagîrker de şehîd bûne, eşkere kir.

Li bakur û rojhilatê Sûriyê, gelê herêmê bi silogana `Bijî Berxwedana Gerîla` meşên girseyî li dar dixe. Roja yekşemê jî, Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê bi tevlîbûna hemû weletiyan, meşek li dar xist. Di meşê de Endama Kordînasyona Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM Ekaz Başa û Hevseroka Yekîtiya Odeyê Bazirganiyê ya bakur û rojhiltê Sûriyê Leyla Ibrahîm ji rojnameya me re axivîn.

**`Ramanên Rêbertiyê û bexwednana gerîla, çareserkirina aloziya ne`**

Endama Kordînasyona Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê Ekaz Başa diyar kir ku, dewleta tirk di êrişên xwe de ne tenê gelê Kurd dike armanc, ew dixwaze aramiyê herêmê û Projeya Demokratîk ya biratiya gelan têk bibe. Başa axaftina xwe wiha domand: "Ev ne cara yekê dewleta tirk biryarên navneteweyî ji bo qirkirina gelê azadîxwaz, bin pê dike. Ji bo têkbirina planên dewleta tirk ya dagîrker, divê gelê herêmê bi taybetî gelê Kurd li her çar perçeyên Kurdistanê li ser piya be û li berxwedana gerîla xwedî derkeve. Lewra gerîla ji bo parastina me ji qirkirinê, canê xwe feda dikin."

Ekaz Başa got, em wek saziyên civaka sivîl, heta dawiyê emê piştgirya gerîlayên azadiyê bikin û axiftina xwe wiha domand: "Bila dewleta tirk ya dagîrker û hevalbendên wê baş bizanibin ku wê bi saya ramanên Rêber Apo û berxwedan gerîla, aloziya Rojhilata Navîn wê çareser bibe. Lewra ev pergaleke demokratîk e û mafê hemû pêkhateyan diparêz e. Endama Kordînasyona Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM Ekaz Başa, di dawiya axaftina xwe de bang li rêxistin û saziyên mafê mirova kir ku, çavê xwe li ser zilm û zora ku li gelê Kurd tê kirin, vekin.



Herwiha di şexsê her 17 şehîdên gerîla hemû şehîdên Kurdistanê bi bîr anî û sersaxî ji malbatên wan re xwest.

**`Hebûna gerîla hebûna gelê Kurd e`**

Hevseroka Yekîtiya Odeyê Bazirganiyê ya bakur û rojhiltê Sûriyê Leyla Ibrahîm, êrişa çekên kîmyawî ya dewlet tirk li dijî gerîla, şermezar kir û got, dewleta tirk û hevalkarên wê, hêz û parêzvanên rûmetê gelê azadîxwaz, şehîd dixînin. Herwiha Leyla bang li dewletên navneteweyî kir ku, helwesta xwe li hember van êrişan, zelel bikin. Û axiftina xwe wiha domand: "Dewleta tirk bi çi heqî bi çekên kimyewî êrişî Herîmên Prastina Medyayê dike! Bi çi heqî gerîlayên ku ji bo parastina mafê gelê xwe têkoşîn dike şehîd dixe!"

**`Dijminê bav û kalan, nabe dostê lawa`**



Leyla Ibrahîn hevkariya Partiya Demokratî Kurdistan (PDK)`ê jî şermezar kir û wiha got: "Yê ku em ji wan re dibêjin birayê me, îro bi hevkariya xwe ya bi êrişên dewleta tirk re, dibe şirîkê kuştina birayê xwe. Li her du aliyên sînorê (Tirkiye û Îran) Hikumeta Herêmê Kudistanê rêya hêzên serdest yên desthiladar yên êrişên wan vekirîne û ew jî êrişê hemû nirxên gelê Kurd deke. Divê PDK`ê van êrişa red bike, lewra hebûna projeya demokratîk hebûna wê ye jî."

Hevseroka Yekîtiya Odeyê Bazirganiyê ya bakur û rojhiltê Sûriyê Leyla Ibrahîn, sersaxî ji mabatên şehîdan re xwest û bi gotina pêşiyan ya ku dibêje, 'dijminê bav û kalan, nabe dostê lawan' axaftina xwe bi dawî kir.

# `Çalakiya Şehîd Bêrîtan plana xayînan têk bir`

**Ferîda Omer-Şehba**

**Endama Kordînasyona Kongra Star ya Efrîn û Şehbayê Necah Hisên tekez kir ku, şehîd Bêrîtan sembola jina berxwedêr e û çalekiya wê bersiva xeta xiyanetê ye û bang li hemû jinan kir ku li ser şopa Şehît Bêrîtan tekoşîna xwe xurtir bikin.**

Di 25'ê Cotmeha 1992'an Fermandara gerîla di şerê Başûr de ku weke şerê xiyanetê, tê binavkirin, dema ji aliyê pêşmergeyan ve tê dorpêçkirin, heta guleya xwe ya dawî şer dike û ji bo nekeve dest wan de çalakiyeke fedayî pêk tine.

**`Riya azadiya jinan ronî kir`**

Bi wesîleya Salvegera 30'an ya şehadeta fermandara PKK'ê Bêrîtan (Gûlnaz Karataş) Endama Koordînasyona Kongra Star ya Efrîn û Şehbayê Necah Hisên, şehîda Bêrîtan bi bîr anî û got, Bêrîtan bû sembola xeta jinên berxwedêr.



Necah Hisên axaftina xwe wiha domand: "Şehîd Bêrîtan xwedî dîrokeke dirêj ya têkoşîna şoreşgerî ye. Lewra têkoşîna şehîd Bêrîtan, bû ronahiya rêya azada hemû jinan. Bêrîtan li hember hişmendiya ku ji jinan re dibe kelem, li ber xwe da û bû sembola jina azad. Jinên ku niha li ber xwe didin û tê dikoşin, moralê xwe ji lehengiya şehîd Bêrîtan girtin e."

**`Ji bo parastian maf û doza welat, xwedî hêz in`**

Necah Hisên diyar kir ku berxwedana jinan yên di sedsala 21'an de li ser doza Bêritanan gihiştiye lûtkeyê û wiha got: "Gelek jinên berxwedêr yên ku bûn pêşengê rêya azadiyê yên mîna Sakîne Cansiz, Fîdan, Bêrîtan, Zîlan, Ruken û Saryan bi têkoşîna xwe ji dijmin re diyar kirin ku, ji bo parastina mafê jin û doza welatê xwe, ew jî xwedî hêz û îraden e."

Necah wiha berdewam kir: "Jin reng û hêza xwe di sedsala 21'an de xurt kir da ku ev sedsale bibe sedsala azadiya jinan. Wekî ku herkes dibîne ku li çiyayên azad jin, destan û dîrokê dinivîsinin. Li hemû qadan dengê jinan û serhildanên wan ên li dijî rejîma zilamê desthilad û faşîst, dengvedidin."

**`Çalakiya şehîd Bêrîtan siyaseta PDK'ê ya li ser xiyanetê hatî avakirin têk bir`**

Necah Hisên bal kişand ser xeta xiyanetê ku heta îro ji aliyê PDK'ê ve tê meşandin û wiha got: " PDK`ê ji dîroka xwe ve xeta xiyanetê ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî, li



ser xwîna gelê Kurd, di domîne. Lê çalakiya şehîd Bêrîtan helwestek şoreşgerî û zelal bû ku 1992'an ew têk birin. Herwiha xeta Bêrîtan niha ji aliyê gerilayên Zap, Avaşîn û Heftanînê tê domandin û bi vê xetê darbeyên herî mezin li dijminê hov didin."

**`Hêza jinê hêza civakê ye`**

Necah Hisên bang li tevayîya jinan kir ku, ser şopa şehîd Bêrîtan kar û xebatên xwe xurttir bikin û got, Îro em rûb û tû hemû rêbazên şer yên qirêj tên. Ev şerê qirêj teybet li dijî vîn û tekoşîna azadiya jin e. Lewra hêzên serdest û desthiladar, hewl didin hebûn û nasnameya jinê ji hole rakin û jinê bi sîstema DAIŞ'ê bimeşînin. Ji ber wê divê jin bi berxwedan û têkoşîna xwe planên xayînan têk bibe û Rêber Apo azad bike û tekoşîna azadiyê bi ser bêxe.